Babetên helbestên te çine?

Neteweyî, xwandin, dayik û bab, zarok û…. Hitid.

Tu hez ji kîj helbestvanê kurd dikey û boçî?

(miweyed teyib); çunkî helbestên wî dixoşin û peyvên wî pirr ramanin û peyama helbestê gehandî ye û şîyaye bihayê helbestê bisengînît.

Te bi helbestên xo pişkdarî di çi korr û vîstevalan da kirî ye?

Belê, di vîstevala qeza Dihokê û vîstevala parêzgeha Dihokê û min pila êkê bidest xove îna. Bi rastî gelek keyifa min hat û bo min bû palder ku hêşta xo zîrek kem û xoştirîn helbesta min (azadkirina îêraqê) ye û hez dikem wê di kovara (sivore) da belav kem.

Te divêt li paşerojê bibî ye çi?

Mamosta yan endazîyar.

Dumahîk peyva te çî ye?

Hîvîdarim şîyanên helbestvanên zarok bihêne berçavkirin daku gelek zarok jî pertûka amade biken û supas bo vê dîdarê.

Eva xwarê çend dêrekin ji helbesteka (novîn) ê bi navê qutabî:

Ey qutabî pir hêjayî
paşeroja milletayî
Ey qutabî tu cevenigî
ji bo dujmin tu bi tivengî